



EuroKurd Human Rights-EHR
Hejmar: 12/A, Nîsan 2009 - Stockholm

Rapor:
Sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê

Gabar Çiyan / Zarathustra News

Naverok

Pêşgotin

Beş I, WomenAid

Beş II, Wadi

Beş III, Ronak Faraje

Beş IV, Zeynelabidîn Zinar

Wêne

Pêşgotin

Sunetkirina keçan, girêdan û kontrolkirina hîsên jinantiyê ye. Ji baweriya dîtina jinê, weke mal û navgînek kêfxweşiyê, tê. Encamên pêşerojê nayê hizirkirin. Nexweşiyên bedenî û rûhî nayên hesab kirin. Xeyal û evîndariya jinan nabe cihê lêpîrsînê...

Em ê bi vê dosya taybetî rastiya sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê bînine holê. Istatîstîkên li ser herêmê, dîtina kesên bûne qûrban û pisporên pîrsê bikin mijara xwe. Armanca ew e ku, rastiya li Kurdistanê bê dîtin. Pîrs bibe cihê niqaşan.

Li gorî statîstîkan ji % 60 jin û keçên Kurd, anku zêdeyî nivê civatê ji ber sunetkirinê seqet mane.

Sunetkirina keçan sucek giran e ku li dijî keçan, li gelek aliyên cîhanê pêk tê. Ev perçeyek ji pêla hişkî û hovîtiyê li hemberî jinê ye. Bi rêya hevkarîya dezgehên fermî û însanî rê dikare li ber bê girtin. Hevkarîya pîr alî dikare vê hovîtiyê rawestîne.

EuroKurd Human Rights li dijî sunetkirina keçan li Kurdistanê kampanyek daye destpêkirin. Kampanya me hetanî encamê bi dest bixîne dê bidome.

Sunetkirina keçan ne çand e, ne jî ji baweriyê tê. Ew sucek mezin û cidî ye. Divê bê zanîn ku mafê jin û zarokan berî çand û baweriyên sexte tê.

Daxwaziya me ji Parlamentoya Kurdistanê û Hikumeta Herêmê ew e ku sunetkirina keçan bi rêya qanûnî qedexe bike. Rê li ber sunetkirinê bigire. Kesên suçdar bêne cezekirin û komîteyek çavdêr bê avakirin ku pîrs ji holê rabe.

Stockholm, Nîsan 2009

Beş I

Di beşê yekem de, em ê hevpeyvîna bi rêvebira têkiliyên navnetewî ya dezgeha "WomenAid" ê, Bayan Nasih bi we re par vekin. Hêja Nasih li ser pirsê pispore, û bi xwe bûye qûrbana sunetbûyînê. Gelek spas jibo hevkarîya rêvebira WomenAid ê Bayan Nasih û tevayên dezgehên beşdar.

Qûrbana sunetbûyînê Bayan Nasih: Sunetkirina keçan ya li Kurdistanê rawestînin!

WomenAid

WomenAid komelek serbixwe ye. Bi çî partîyan û bawerîyan ve ne girêdayî ye. Pirsê jinan ji awira netewî û navnetewî dike cihê nîqaşê. Jinên di bin zilmê de ne, yê ku dibin qûrbana lêdan, îşkencê û cinsî dikarin alîkariyê ji WomenAid ê bigirin. WomenAid pirsê jina ji gelek alîyan ve dihêne rojevê. Derdixîne pêşberî raya giştî. Bi kampanyên xwe bendore li rêvebiran dike. Bi vê rêyê rewşa jinan baştir dike. WomenAid beşdarî projeyên jinan dibe. Bi organîzasyonan re dixebite. Piştgiriya aborî bi dezgehên însanî re par vedike. Navenda WomenAidê li Stockholmê ye.

- Ji kerema xwe re qala xwe ji mer e bike, Bayan Nasih kî ye?

Ez li gundekî nêzî Kerkûkê hatim dinyê. Ez hetanî 15 saliya xwe li wir bûm. Di 1985 an de gund ji aliyê rejîma Iraqê ve hate xirakirin û bi erdê re kirin yek. Ji rûniştvanên gund re ji bilî barkirina başûrê Iraqê anjî kampên penaberan li Erbîlê (Bneslawa û Dareto) çî cihekî din tune bû. Min, li gundê Hasarê dibistana seretayî û lîse li Kerkûkê xwend. Dêbavê min dixwest ez bixwînim û bibim xwedî meslek. Li gund ez keça yekem bûm ku macala xwendina bilind bi dest xist, bi saya dêbavê xwe perwerdeya xwe bi dawî anî.

Min li zanîngeha Baxdayê beşa aborî û îstatîstîkê xwend. Min di navbêra 1991-93 an de li Kurdistanê bi fedekariya şexsî bi du dezgehên almanî re xebatên civakî kir. Ji sala 1992 an ve ji bo maf û azadiya jinan li Kurdistanê, dixebitim. 1995 an de hatim Swêdê. 2005 an ande, perwerdeya min ya li zanîngeha Stockholmê beşa civakî bi dawî hat û min dîplomeya xwe girt. Xebata min di "Kvinnofrid"ê weke sekretera sosyale didome.

- Tu ji girêdan û rêvebirina karê navnetewî ya "WomenAid" ê mesûl e. Ji kerema xwe re, me li ser armanca WomenAid ê û rola xwe ronî bike...

Ez, ji 2007 ve endama rêvebir ya Komela WomenAid ê me. Komele, ji awira netewî û navnetewî li ser pirsên jinên di bin tadeyî û zilmê de ne, mûjil dibe. Serbixwe ye. Em dixwazin rewşa jinê ji awirên cewaz bînin rojevê û bikin cihê nîqaşê. Da ku karîbin bandorê li desthilatdariyê bikin û rewşa jin û zarokan baştir bikin. Ez ji rêvebirina xebatên navnetewî mesûl im. Rewşa jina li gelek aliyên cihanê dihênime rojevê. Weke mîsal rewşa jinên li Kurdistanê pirsek giring e. Cihê jinên Kurda di dilê min de ye û ez bi wan re dijîm.

- Tu xwe amade dike ku nameyekê bişîne ji Dezgeha Sihetê ya Cihanê-Who yê. Balkêşana wan li ser pirsê sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê, armanca te ye. Li Kurdistanê rewş gelekî xirab e?

Min bi munasebeta "roja 6 sibatê ya UN ê li dijî sunetkirina keçan", berpirsiyarî da ser milê xwe. Nameya min ya ji Dezgeha Cihanê ya Sihetê - WHO re, li ser pirsê sunetkirina keçan e û hetanî 8 ê adarê wextê wê heye. Xelk dikare bi îmzeyên xwe, bir rêya malpera me piştgiriya bikin.

Rewş, ji zanabûn û texmînên me pir wîrdetir û xirabtir e. Statîstîkên di dest me de tevayê herêmê û beşek ji taxên kerkûkê hemêz nake. Êşa kesên qûrban nebûye cihê lêkolînên berfireh, ne ji aliyê rûhî û ne jî bedenî ve di destê me de çî zaniyarî tune ye.

Ne ecêb e ku îro li gelek deveran jinên sunetbûyî ji aliyê mêrên xwe ve bi "bê hîs, bê zewq, cemidî û bê nirx" têne nîşandan, suçdarîkirin. Hêviya min ji WHO ew e ku li ser problemê kur bibe, û Iraqê têxe nav lîsteya welatên keçên biçûk sunet dikin. Divê ew bi rêvebirên herêma re programek netewî pêk bînin. Pir girînge ku zaniyariyê li ser xeterên sunetê belav bikin û xelkê li ser pirsê ronî bikin.

- Hêviyên te ji dezgehên însanî û Hikumeta Herêma Kurdistanê çî ne?

Hêviya min ji dezgehên însanî ew e ku, kampanyek netewî li seranserî Kurdistanê, li ser bingeha belavkirina zaniyariyê û aliyê neyênî yê sunetbûyînê bidin destpêkirin. Pirs bi mafê mirovan, wekhevî û demokrasîyê ve girêdayî ye. Ez di 5 saliya xwe, di 1975 an de bûme qûrbana sunetkirinê û baş zanim êşa wê îşkencê. Ez naxwazim keçên biçûk yê Kurdistanê mîna min bibin qûrban û wê êşê bîkşînin. Di dema 2000 î de neqedexekirina sunetê li Kurdistanê cihê fêdiyê ye. Pêwîst e KRG bi rêya derxistina qanûnekî sunetkirina keçan qedexe bike û kirinê wisa mehkûm bike. Kesên suçdar ceze bike. Her wisa ji gelek aliyan, ji awira hizirkirin û aboriyê alîkariyê bide kesên dijberî sunetkirinê dixebitin. Divê KRG bi rêya kanalên tv, radyo, mizgeft, nexweşxane û navnedên partiyan kampanya li dijî sunetkirinê bide destpêkirin. Divê ev kampanya di demên cewaz de çend caran bê dubarekirin. Mirov dikare îro dest pê bike.

- Tu bi xwe jî qûrbana sunetbûyînê ye. Bubuhure ji bo ku em ê wan rojan bînine bîra te û ji te rica bikin ku qala prosesa sunetkirina keçan bike...

Belê, qet ne hêsan e ku mirov wê demê bibîr bîne. Ez qûrban im, lê naxwazim ku weke qûrban bême binavkirin. Qalkirina wê, tirs û xengîniya di dilê mirovî de heye zêde dike. Min hedefek daye pêşîya xwe: Ez naxwazim ku piştî 20 salên din keçên me hesabê sunetbûyîna xwe bikin cihê pirsê.

Sûnetkirina keçan li Kurdistanê bi hostebûn û di bin perda bêdengiyê tê kirin. Ne weke dema sunetkirina law / kurikan e, ji keçan re çî şahî nayê çêkirin. Ji ber ku hişkîyek bêşînor li dijî lawikan tê karanîn, ez bi xwe li dijî wê me.

Sûnetkirina keçan gelek caran li mala hinekan din dikin. Pîrejinên sunetkar ku li herêma xwe têne nasîn "Xetena an sunet"ê dikin. Hayê keçikê jê tune dê sunet bibe. Mirov diçe wir, lê nizane dê çî bibe. Paşê pê dihise ku pirs cidî ye û dê karek nexweş pêk bînin. Mirov ditirse. Carna gelek keç bi hev re tînan sunetkirin. Dest û nigên mirov ji aliyê yek an du jinan ve tê girtin, şidandin.

Dema ez hatim sunetkirin, zeîf û biçûk bûm. Jinekê destûnigên min hişk girt. Dema mirov baş/hişk neyê girtin dikare seqetiyên mezin bibin. Mirov ji tîrsa û bêçaretîyê dilerize. Bi carekê êşek dest pê dike û şewata wê tevayê laşê mirovî radipêçe. Sunetkirin di 5-7 saliya keçan de pêk tê, lê sal dikare carna bê guhertin. Aletên wan ji cilêt /cuzanan pêk tê. Sunet bi axaftina pîrejinê ya "tu keçek hêja û bêtîrs bû ku negiriya" bi dawî tê. An çî kes nayê û birîna mirvî derman nake. Ji xwe dema mirov 5-7 salî ye nizane birîna xwe jî derman bike.

- Piştî salên derbasbûyî, tu dikare hîsên xwe bihêne zimên?

Min bi xwendina pirtûkên femînîst û doktora Misirî Newal Al-Sadawi li ser "sunetkirina jinan û aliyên wê neyênî li ser cinsiyetê" di 16 saliya xwe de xwend.

Ez jî yek ji wan jinan bûm ku wê qal dikir. Lewma ez hîsên min bi hers û xemginiyê barkirî bûn. Pêşeroj, evîndarî û zewac tê bîra mirovî, li aliyê din êşa jina biqisur laşê mirovî radipêçe. Lê nuha ez zanim ku sunetkirina keçan pêlkirina mafê mirovan yên bingehîn e, û nirxê mafê mirovan di şexsê min de hatiye pêlkin. Tev ji ber nezanî, bawerî û toreyên şaş ku bi rêya wê keç dihatin sunetkin.

NAMEYA BAYAN NASIH BO WHO YÊ

Nameyek eşkere ji Organîzasyona Cîhanê ya Sihetê-WHO ê ye re

Mijar: Sûnetkirina keçan (qîz) li Başûrê Kurdistanê

Ev bangek eşkere ye. Bi vê bangê em dixwazin bala cîhanê bikşînin ser beşek ji Kurdistanê Iraqê ku li wir, li dijî keçên biçûk metodên barbarî û îşkencekirinê tînin bikaranîn.

Hejmarek îstatîstîk û lêkolînên ilmî li ser xeterên sûnetkirina keçan li Herêma, bi tebîniyên xwe alarmê didine me, me şiyar dikin. Da ku em pirsê çareser bikin.

Sedemên ku pirsê dike tabû û rê li ber eşkerekirina buyerên wisa digirin, nezanî ye, nêzîkbûna kevneşopî li laşê jinê û pirsê cinsî ye.

Li Iraqê qîzên biçûk tînin sunetkin. Em ew kesên ku vê bangê îmze dikin, ji WHO yê dixwazin ku navê Iraqê ê tîxe lîsteya wan welatan ku li wir keç tîne sunetkin. Dema rastiya li Iraqê bê dîtin û pejirandinê dema pirsê sunetkitina qîzên biçûk bala cîhanê bikşîne. Di heman demê de zext bikeve ser rêvebirên fermî ku karê xwe baştir bikin û rê li ber buyerên wisa bigirin.

Dezgeha Almanî "Wadi" ji sala 2004 an û hetanî nuha li wir li dijî sunetkirina keçan xebata xwe bê westan dide domandin. Wan li Kurdistanê, di destpêka 2008 an de lêkolînek berfireh ku 25 dibistanên seretayî (destpêk) li cihê Bitwênê hemêz dike, pêk anî. Encama lêkolînê derxist holê ku ji 1733 keçan 1645 kes hatine sunetkin. Ev hovîti ye û li gorî peymanên mafê bingehîn yê zarok û mirovan, sucek mezin e!

Hikumeta Herêma Kurdistanê-KRG di meha dawîya 2008 an de pêşniyara "qanûna qedexekirina sunetkirina keçan", qebûl nekir û paş de şand. Ev tenê mîsalek e. Mirov dikare bi rêya wê fêhm bike ku rêvebirên herêma çiqasî giringiyê didin pirsê parastina mafê jinan û zarokan. Li hinek aliyên Herêma Kurdistanê rewş wisa ye. Li ser tevayê Iraqê, mixabine ku çî îstatîstîk di destê me de tune ye.

Pêwîst e em bi hev re dengê xwe li dijî sunetkirina keçikan bilind bikin. Ji bo rawestandî û qedexekirina sunetkirinê gavên pêwîst bavêjin. Her wisa em destê alîkariyê dirêjî wan keç û jinên ku bi vê rêyê hatine birîndarkirin bikin û birînen wan derman bikin. Stockholm 6 februari 2009.

Beş II

Di beşê 2:em de, em ê hevpeyvînên bi rêvebirên dezgeha navnetewî "**WADI e.V. - Verband für Krisenhilfe und solidarische Entwicklungszusammenarbeit**" pêşkêşî we bikin. Wadi ji bo mafên jin û zarokan, başkirina rewşa zindaniyan li Kurdistanê karên giring dike. Her wisa bi îstatîstîk, "mobile team"ên jin û çalakiyên wan li ser pirsgerêka sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê jî, tê nasîn.

Navenda Wadiyê li Frankfurt a Elmanyayê ye. Navendên wê yên xebatê pir in. Me xwe gehand navendên Wadiyê li Ewropa û Kurdistanê. Dostê hêja û rêvebirê Wadiyê birêz Thomas v. der Osten-Sacken bi germî nêzî me bû. Birêz Arvid Vormann ji me re bû alîkar. Ji Silêmaniyê hêja Suad Evidrehman li ser gelek pirsan zaniyariyên giranbuha da me, me ronî kir. Ji bo dostaniya rêvebirên Wadiyê, xebat, nêzîkbûn û hevkariya wan gelekî spas. Em bi xebatên we serbilind in.

Wadi:

Tunekirina sunetê ji Kurdistanê dê wext bigire

- Ji kerema xwe re li ser Dezgeha Wadi û armanca wê me ronî bike...

Wadi di sala 1991 de bi beşdarbûna gelek kesan, di dema buyera Xelîçê, bi beşdarbûna projeyan li Iraqê û başûrê Kurdistanê, ava bûbû. Thomas yek ji wan kesên beşdar bû. Wê demê xwendevan bû û li başûrê Iraqê ji bo "Christian Relief Projekt" dixebitî. Ew bû şahidê rastiya hişkiya li welatî û li aliyê din mecalên guhertinê jî li wir didît. Mecalên guhertinê û pêşketinê bêhtir li Herêma Kurdistanê hebû û Wadi li wir di 1993 an de projeya pêşî da dest pê kirin.

Wadi wê demê de li gorî armancên gavbigav pêş ket. Wisa hatibû hizirkirin ku, li Rojhilata Navîn û Ewropayê karê polîtîk di gel alîkariya pratîk bihata rêvebirin. Wadi, polîtîka Elmanya ya li hemberî penaberên ji Iraq û rojhilata navîn jî bi hişkî rexne dikir.


Wadi ji bo pêşketina demokrasî û aşitîyê li Rojhilata Navîn ku herêma dîktatorên xwe gelek in, dixebite. Li gorî xebatkarên Wadi, civata ku xebatên xwe eşkere û vekirî be, ew ji bo qonaxa pêşxistina demokrasîyê xwedî rolek mezin e. Ji bo guhertina civatê armançek Wadi heye: Piştgiriya kesên bindest û bûna dengê wan. Wadi giraniya xebata xwe dide jin, zarok û girtiyan.

Wadi di 16 salên dawiyê de alîkariya jinên birîndarên lêxistin û hişkiyê kir. Destê xwe dirêjî wan jinan kir ew ji ber pirsên namûsê di bin tehdîdê de bûn. Wadi mecalên xwe fêrkirina xwendinê û kursên perwerdeya meslekî ji bo jinan organîze dike. Wadi ji bo destpêkirina weşanên radyoyî alîkarî pêşkêş kir.

Wadi 2004 an de buyera sunetkirina keçan li Kurdistanê derêxist holê. Ji wê demê heta nuha ji jîholêrakirina wê piralî dixebite: Destpêkirina kampanyek eşkere li dijî sunetkirina keçan. Kampanyek polîtîk ji bo ku parlemento bi qanûnekî sunetkirina keçan qedexe bike û weke sunetkirinê weke suc îlan bike. Em bi alîkariya Mobil Teama Wadi giraniyê bidin belavkirina zaniyariyê û perwerdê.

- Hejmara keçên li Herêma Kurdistanê tèn sunetkirin çiqas in?

Li ser hejmara sunetkirina keçan di destê me nexşeyek heye. Nexşe li gorî kêmbûn û zêdebûna buyerên sunetkirinê aktîf e, tê nûkirin. Kesên bixwazin dikarin di malpera www.stopfgmkurdistan.org ê de pêşketinê bişopînin.



- Rêya lêgirtin û çareseriya rawestandina sunetkirina keçan li Kurdistanê çiya?

Pirsek baş e. Em gelekî bi erênî nêzî pirsê dibin, lê dinêrin. Xebata çend salan ji nuha ve dest pê kiriye ku fêkî bide me. Di 2004 an de, dema me, qala xebata li dijî sunetkirina keçan dikir, ji me re dihate gotin ku, em dikarin ji ber pirsê bêne kûştin. Lê civata Kurdan nîşan dan ku ew têra xwe tê gihçtî ne û dikarin vê pirsgerêkê çareser bikin. Nuha gelek kes di medyayê de niqaşa pirsê dikin. Hikumeta Herêmê jî eleqatek nêz nîşan da ku ew dixwazin pirsê çareser bikin. Li gorî raporên Mobila Team, gelek gund piştî perwerdeyê nema keçan sunet dikin.

Îro bi saya medyayê gelek rûniştvanên gundan zanin ku sunetkirina keçan dibe sedema seqetkirina wan. Lewma jî piştgiriya xelkê bo me zêde dibe û Gelê Kurd xwe amade dibîne ku sunetkirina keçan bi cî û li dawiya xwe bihêle.

Lê (ji bo rawestandina sunetkirinê) rêyek dirêj li pêşiya mirovî heye. Mirov hêvî dike ku Hikumeta Herêmê beşek ji bersiyartiyê hilgire ser milê xwe û şerê li dijî sunetkirinê bi xwe bike.

xxxx

Suad Evdirehman:

Ji ber sunetkirinê li Kurdistanê % 60 jin û keç seqet bûne

- Suad Evdirehman kî ye? Hûn bi çi karî dadikevin?

Suad li bajarê Silêmanyê bi dezgeha Wadi re dixebite û li wir rêvebirriya projeyên jinan dike. Xwedî tecrube ye û tecrübeya wê ya bi salan piştî xwe dide xebata bi jinên li gund û bajaran.

Wadi yek ji wan insiyatifgiraye ku kampanya li dijî sunetkirina keçan li Kurdistanê "StoppFGM" daye destpêkirin. Suad ji wê demê heta nuha bi xurtî li dijî sunetkirina keçan dixebite.

- We çima kampanya "StoppFGM" da destpêkirin?

Di sala 2004 an de, komek me ku jinan pêk dihat derêxist holê ku sunetkirina keçan li Kurdistanê, cihê germiyanê pêş dikeve, belav dibe. Lê di destê me de li ser berfirehiya pirsê zaniyarî tune bû. Me biryar da ku kampanyayê bi hev re bidin destpêkirin.

Îro, piştgiriya kampanya me di nava kurd û çandên din de zêdetir dibe. Dezgehên netewî û navnetewî li ser pirsê kurtir dibin...

- Pirsê sunetkirina keçan li Kurdistanê pir ciddî ye, an na? Hêviyên we ji Hikumeta Herêma Kurdistanê çi ne?

Belê pirs têra xwe ciddî ye. Ji ber sunetkirinê ji % 60 keç û jin seqet bûne. Îro jî gelek jin û keç seqet dimînin.

Em li benda wê ne ku, Hikumeta Herêma Kurdistanê pirsê sunetkirina keçan ciddî bigire û li dijî wê raweste. Divê pirs were rojeva Parlemantoya Kurdistanê û parlemanto qanûnekî ku sunetkirina keçan qedexe bike, derxîne.

Li dijî sunetkirina keçan li Kurdistanê, pêwîstiya me bi piştgiriya heye. Em li benda wê ne ku, hemû kes û dezgehên fermî û ne resmî li dijî vê metoda barbarî dengên xwe bi me re bilind bikin.

Li gorî Stopfgmkurdistan rewşa Kurdistanê

Stopfgmkurdistan: Sunetkirina keçan suc e ne çand e

FGM tê wateya sunetkirina keç û jinan. Di dema sunetkirinê de, ji organên wan yê cinsî, cihê herî hesas "klitorîs" (zimanê biçûk) tê jêkirin. Bi jêkirinê, zewqa wan ya cinsî tê korkirin. Da ku keçbûna wan, anku namûsa wan heta dema zewacê bê parastin.

Piştî sunetkirinê, gelek aliyên neyênî û pir xirab pêk tê. Beşek ji keçan di nava xwîna de dimînin, brînên wan mîkrop digire û dimrin. Rûhê hinekan ji wan birîndar dibe. Herdu alî jî demek dirêj, pêşerojê, di dema zewacê û hemîlebûna wan de bi problemên mezin tene hemberî hev.

Sunetkirina keçan û xetera mirinê

Keçên biçûk ku emrê wan 4 û 12 an de ne tene sunetkin. Li cihên ne eşkere operasyonên sunetê dibin. Organ nayê pûçkirin. Aletên sunetê, cilê û cûzan nayên kelandin û bi mîkroban barkirî ne. Keç tê tazîkirin, li ser çoka pîra wê û bi alîkariya kesên li wir tê girtin, girêdan anjî kontrolkirin. Zimanê organê tê jêkirin. Keç di nava gola xwîna de dimîne. Jibo ku herikandina xwîna bê rawestandî, xweliyê bikar dihênin. Gelek caran keça biçûk li ser qalibên qeşayê (buz-ice) rûdine...

Piştî sunetkirinê gelek keç dimrin. Yê namirin jî hetanî dawiya emrê xwe şerê nexweşiyên rûhî (psîkolojîk) dikin, anjî bi nexweşiyên din re dijîn.

Jinên ku bi rêya "mobile team" dixebitin û hevkarên Wadi ne di sala 2004 an de qala pêkhatina sunetkirina keçan li aliyê Germiyanê, ku dikeve başûrê Silêmaniyê kirin. Kurbûnên li ser pirsê derêxist hole ku, gelek jin ji ber sunetkirinê seqet mane. Mobile Team jibo ronîkirina pirsê li herêmê, bi 1500 jin û keçên ciwan re qise kir, hevpeyvîn pêkanîn. 907 kes ji wan bûbûn qûrban û hatibûn sunetkirin. Paşê li Erbilê lêkolînek pêk hat. Derket hole ku ji 440 jinan, 380 ê hatine sunetkirin.

Jibo ku rewşa jinan li başûrê Kurdistanê bi giştî derkeve hole dezgeha Wadi di 2007 an de dest bi lêkolînek fireh kir. Ji dever û malbatên cewaz, zêdeyî 1800 jinan re rûniştin û li wan guhdarî kirin. Zaniyariyên destpêkê wisa nîşan didin ku sunetkirina keçan û jinan pir zêde ye. Li hinek deveran ji % 60 û li deverên din % 100 hatine sunetkirin. Tenê li Duhokê kême, ji % 10 e.

Encama li herêma Pişder û Raniyayê wêneyek dramatîk li ser rewşa nîşanî mirov dike. Ji Adarê hetanî dawiya tebaxa 2008 an, li 50 gundan û 25 dibistanên keçan 115 serdan pêk hatin. Li Raniya bi 2952 jin û keçan re hate qisekirin. Ji wan jin û keçan 2810 kes ji ber sunetkirinê, brîndar û seqet mabûn. Anku ji % 95 bûbûn qûrbana sunetbûnê.

Kêmbûna zaniyariyê rê ji sunetkirinê vedike

Li Herêmê, mîna gelek pirsên cinsîyetê, sunetkirina keçan jî pirsê tabu ye. Êşa jinê bi bêdengkirinê hatiye fetisandin /sînorkirin. Seqetbûn û êşên sunetê ji aliyê rûniştvanên herêmê ve weke pirsê girêk nayê dîtin. Ronîkirina rûniştvanan û jinan li ser pirsê karekî pir giring e.

Nezanî û kêmbûna zaniyariyê rê vedike ku sunet bibin. Li gorî hinekan sînorkirina nexweşî û mîkrobiyan karekî dijwar e. Beşek jî pê bawer in ku sunetbûyîn jibo musulmanan ferz e û dive bibe.

Berdewamî û nerawestandina sunetkirinê piştî xwe dide nêrîna li jinê. Jin bi giştî weke mal, û mulkên mêr dihejmêrin. Jinên serbixwe, û keçên zana xwe weke kesekî serbixwe dibînin. Pêwsîtiyên xwe baş zanin û hîsên xwe teslîmî çî kesan nakin. Kesên wisa ne hêsan e ku ji wan re bibin qûrban.

Çavkanî jibo zaniyariyê: <http://www.wadinet.de/index.php>,
<http://www.stopfgmkurdistan.org/>

Beş III

Di beşê 3:em de, em ê cî bidin hevpeyvîn û lêkolîna nivîskara hêja Ronak Faraje. Xanim Faraje bi çalakiyên xwe li dijî sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê tê nasîn. Li ser pirsê lêkolînên wê hatine belavirin. Lê lêkolîna wê ya herî dirêj û balkêş di bin navê "Sunetkirina keçan li Kurdistanê" weke pirtûk ketibû ber çapê. Çapa pêşî pir sînorkirî bû. Wê lêkolîna xwe di kovar û rojnameyan de belav nekir. Hêja Faraje li derveyî welêt dijî. Me xwe gehand Xanim Faraje û pirsên xwe pêşkêşî wê kir. Em hevpeyvîna pê re û beşek giring ji lêkolîna wê pêşkêşî we dikin.

Lêkolîner Runak Faraje Rahim:

Divê Parlementoya Kurdistanê sunetkirina keçan qedexe bike

- Sedemên nivîsîna pirtûka te ya "Sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê" çi ye?

Di sala 1991 ê, dema Kurdistan azad bû, ez mudirê dibistana lîseyê li nêzî Raniyê, kampa penaberan Hadji Awayê bûm. Kamp ji aliyê Saddam ve hatibû avakirin. Kesên gundên wan hatibû kavilkirin li wir dihatin kom kirin. Li dibistanê 900 xwendevan hebûn, ji wan 430 keç bûn.

Di Adara 1992 an de, piştî dibistanê, diçûm ber bi malê. Min dî, xwendevanek keç 6 salî bi cilên zer û dirêj ber bi min ve bazdida. Dayika wê jî dida du wê, dixwest wê bigire û bibe cihê sunetkirinê. Keça biçûk alîkarî ji min dixwest û digot:

"Mamosteya min ji bo xatirê Yezdanî, min biparêze û nehêle dayika min, min bide sunetkirin".

Dayika wê jî ji min alîkarî dixwest ku ez wê bigirim û teslîmî wê bikim. Dema dayikê wê girt, kulmek lê xist û bi destê wê hişk girt û di du xwe de kişand. Min jî da du wan. Paşê berê xwe dan malekê.

Di hundirê malê de pîrejinek û 7 zarokên biçûk hebûn. Wê, ji kîsikê xwe cilêtek derêxist berê xwe da keçikên biçûk ku emrê wan 4-10 salî bûn. Ji tirsê dilerizîn, digiriyan û kezab qetandî bûbûn. Min jê pirsî ku dê çi bike. Wê got ku, ew ê keçikan sunet bike. Ez şok bûm. Min qet bawer nedikir ku tiştek wisa pêk were. Çawa mirov dikarin keçikên wisa biçûk bikin qurban?!

Lê çi kesî li min guhdarî nekir. Pîrejina li wir, bi alîkariya jinên din, terpiyên keçikên biçûk ji wan dikir û zimanên organên wan yê cinsî (zîlik-qitke-klitoris) yek bi yek jê dikir.

Keçika 6 salî Shina jî wisa bûbû qurban: Pîrejinê piştî destpêka bi navê Xweda, bi ciletê ew jî di nava xwînê de hiştibû.

Xwîna Giabanda 4 salî qet ranediwetsiya. Wê tazî kirin, li ser teştê ku bi ava qeşayê dagirtî bû, rûniştandin.

Wê rojê 29 keçik bûbûn qurban. Qet xewa min nedihat. Qêrînî, girî û xwîna wan ji ber çavê min nedîçû.

Adinî rojekî, ez çûm dibistanê. Min li dibistanê lêkolînek kir. Derket holê ku ji 420 keçan 380 sunetkirinî ne...

- Qala çalakî û lêkolîna xwe ji me re bike. Tu gihîste armanca xwe an na?

Min, piştî xebatên statistîk û raçavkirinê hewil da ku bi wan zaniyariyan xelkê ronî bikim. Bi armanca çêkirina semîneran 17 salan li dora Rania, gundên Pişdar, Hewlêr û Xalifan geriyam. 2 salan rêvebirîya radyoya "Dengê Jinan" kir û tê de programên li ser pirsê sunetkirina keçan belav kir. Radyoya ku navenda xwe li Raniyê bû, li ser pirsê xebatên hêja kir.

Dema ez hatim Silêmaniyê, xebata min di navenda informasyonê ya jinan de dest pê kir. Li wir, di radyoya "Gali Kurdistan" de di gel Hana Shwan rêvebirîya programekî kir. Beşek ji programê li ser sunetkirina keçan bû.

Paşê projeyek me bi NPA ya Norvêcî dest pê kir. Proje 81 gundên Germiyanê hemêz dikir. Giraniya karê min belavkirina zaniyariyê li ser pirsgerêka sunetkirina keçan bû. 2004 an de Centerê projeyek din ku berê xwe bide 41 gundên Rania û Pişdarê dest pê kir. Ez beşdarî gelek debatan bûm, 2006 an de debata di Azadî TV, 2007 an de Zagros TV û hwd. Paşê beşdarî konfernasa li Hewlêrê ya Khato Zin û li Silêmaniyê ya NPA yê bûm.

Belê, çalakiyên me baş bûn. Ji bo ronîkirina xelkê li ser pirsê rolên baş lîstin û bandorek erênî û piralî li xelkê kir.

- Mirov çawa dikare dawî li sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê bîne?

Divê tevayê dezgehên jibo ronîkirina xelkê bixebitin. Her wisa mirov li benda wê ye ku Parlamentoya Kurdistanê bi qanûnekî sunetkirina keçan qedexe bike...

Sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê

Lêkolîn: Runak F. Rahim

Nakokiyên li pêşiya lêkolînê

Lêkolînên wisa civakî ku bi giranî li ser pirsên jinan in, zêde pêk nayin û wextek taybetî dixwazin. Sedemên wê jî ev in:

- 1- Nebûna navend anjî dezgehekî ku piştgiriya aborî bide projeyên wisa
- 2- Lêkolînên wisa têra xwe bi mesref in, çûna xwe gelek in.
- 3- Ji ber nakokiyên polîtîk zêde ne balkêş in
- 4- Hejmarek mezin ji xelkê pê bawer in ku, hejmarek ji pirsên me yên civakî hesas in û bêhtir yên malbatî ne. Lewma naxwazin zaniyariyê bidin lêkolînên wisa eşkere.

Ez bawer im ku ev lêkolîn gavek hêja ye. Ez hêvî dikim ku karîbim faktorên bingehîn yên li ser pirsê sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê derêxînim hole.

Armanca lêkolînê

- 1- Berhevkirina zaniyariyê ji Silêmaniyê, Erbil û Duhokê
- 2- Peydekirina çareseriyên jibo dawîanîna sunetkirina keçan
- 3- Eşkerekirina deverên mexdurbûyî
- 4- Eşkerekirina faktorên bingehîn
- 5- Berhevkirina zaniyariyê li ser aliyên neyênî yên sunetkirina keçan
- 6- Eşkerekirina kesên birayara sunetkirinê li male didin

Binavkirin

Qitka / klitoris: Beşê herî hesas yê organa cinsî ye (keç)

Cihên kolektîv: Di dema Sadam Hisêynî de gelek gund û dever hatibûn kavilkirin û xirabkirin. Rûniştvan li cihên kolektîv hatibûn komkirin.

Bandora neyênî ya sunetkîrinê

Di dema sunetkîrinê de zimanê organên keçan têne jêkirin. Rola wê di dema eleqata cinsî de mezin e. Organa şehwetê ye. Bi jêkirina wê, jin zewqê ji eleqata cinsî nastînin. Sunetkîrîna keçan sedema herî mezin ya jinantiya cemidî ye. Kesên ku sunetê dikin, gelek caran nezan in û keçan seqet dihêlin.

Emrê wan

Emrê keçikên têne sunetkîrin li gorî herêman tê guhertin. Lê bêhtir di 4-5 saliya xwe de têne sunetkîrin. Zaniyariyên ji hinek deveran nîşan didin ku, keçikên nû ji dayika xwe çêdibin, têne sunetkîrin. Bandora neyênî ya sunetkîrinê piştî mezinbûn û zewaca wan derdikeve holê.

Ne eşkerekirina pîrsê

- 1- Jin fedî dikin ku qala sunetkîrîna keçan û jêkirina beşek ji organa xwe ya cinsî eşkere bikin
- 2- Kesên ku sunetê dikin, sunetkar, bêhtir pîrejin in. Nexwende ne û ji aliyê bijjîkî û fermî ve karên wan derveyî pîvanê sihetê ye.

Aletên sunetkîrinê

Pîrejinên sunetkar sunetê bi kêr, cuzan anjî cilêta pêk dihênin. Hayê wan ji paqîjiya sihî zêde tune ye. Bi heman kêr anjî cilêta dikarin 10 keçikan sunet bikin.

Ji bo rawestandina xwînê, piştî sunetê, birîn bi xweliyê tê seyandin. An jî keçikê li ser ava qeşayê rûdinînin. Ev yek jî dibe sedem ku, birîn mîkroban bigire û seqetiyên mezin û wendakirina xwînê pêk were. Keçên qurban, ji ber êş û tîrsê, hetanî dawiya emrê xwe, bi nexweşiyên laş û rûhî şer dikin.

Firehbûna lêkolînê

Zaniyarî bi giştî ji 40 480 hevpeyvînan hatine berhevkirin. Li gorî vê:

Li Erbilê

8 tax, li her taxekî 30 hevpeyvîn

Dezgehek mamosteyan

5 bajarên kolektîv, li her bajarekî 800 lêkolîn û hevpeyvîn

55 gund, li her gundekî 40 hevpeyvîn hatin kirin.

Li Silêmaniyê

8 tax, bi giştî lêkolîn bi rêya 1000 forman

8 dibistanên destpêkê yê keçan

6 bajarên kolektîv, li her bajarekî 700 lêkolîn û hevpeyvîn

496 gund, li her gundekî 40 hevpeyvîn hatin kirin.

Li Duhokê

1 taxek

1 dibistana destpêkê ya keçan

1 bajarek kolektîv

12 gund bûne cihê lêkolînê.

Encama lêkolînê

Lêkolîna li ser keçên sunetkirî ku emrê wan 1 meh heta 10 salan nîşan dide ku:

Keçên ku bi giranî bûne qûrbana sunetkirinê 4-10 salî ne. Paşê yên 1 mehî û 3 salê tên. Yên ku emrê wan di ser 11 an de ne, di rêza 3:em de ne.

Di lêkolînê de derket holê ku: Ji 40 480 jin û keçan 30 324 sunetkirinî ne. 10 352 kes zarok in û emrê wan 1-16 salî ne.

Deverên jidayikbûnê

- Ji 6 132 keçan ku li bajarên kolektîv dijîn, 2 700 kes li gundan hatine dinyê. Bajarên kolektîv di salên 1979-87 an de ji aliyê Rejîma Baas ve hatibûn avakirin. Wê demê kesên ji gundan li wir bi cî kiribûn.

- Ji 20 320 jinên ji gundan, 12 240 kes piştî valakirina gundan li bajarên kolektîv hatibûn bi cî kirin.

- Piştî 1991 î, gund careke din hatine avakirin. 8 150 kes li wan gundan hatine dinyê.

- Ji 3 802 keçên sunetkirî li bajêr, 2 790 kes li bajêr û 507 kes jî li gundan hatine dinyê.

Sedem

Piştî kurbûna li ser 2 000 blanketan ji tevayê herêmê, diyar bû ku;

- Ji 30 324 jinan 24 435 bawer dikin ku sunet ji aliyê olî ve ferz e, ji bo Xweda bi cî dihênin.

- Li bajêr, ji 3 802 jinan 1 202 bawer dikin ku, piştî bi destxistina azadiyê mirov dikare rê li ber sunetkirinê bigire.

Hevpeyvîn

Doktora pispor li ser nexweşiyên jinan, Dr. Rezan diaxife:

"Sunetkirina keçan bêhtir li Rania pêk tê. Bi sedan dêbav bi qîzên xwe yê sunetkirî, ku laşê wan di nav xwînê de maye dihênin cem me. Piştî muayenê mirov tê digihêje ku, ew nû hatine sunetkirin. Ji ber ku kesên wan sunet dikin gelek caran nezan in, perçeyên jêdikin zêde dibe. Sunetkirinên wisa bandorek neyênî li laşê wan û ruhê wan dike. Keçên tene sunetkirin, hetanî mezin bibin ji tirsê rizgar nabin.

Lê ya herî xirab piştî zewaca wan dibe. Ji ber ku ew ê çî tamê ji cinsiyetê nebînin û cemidî bin. Sarbûna jinê ji % 70-80 î bi berdana jin û mêran bi dawî tê".

Awaz Osman ku li dadgeha Silêmaniyê lêkolînêr e, dibêje:

"Ji % 70 berdana jinan ji ber van sedeman e:

- Sunetkirina keçan, piraîna zarokan, kêmbûna zaniyariyê li ser pîrsa cinsiyetê".

Fatma Ibrahîma 50 salî, karê wê sunetkirina keçan e. Li dora Rania û Dolaraqa gelek keç sunet kiriye. Ibrahim wisa bersiv da:

- Fêrbûna sunetkirina keçan çawa çêbû?

Ez ji pîrejinekê li gundê me fêr bûm. Ew nuha ne sax e.

- Hayê te çiqasî jê heye ku ev kar keçan seqet dihêle?

Zêde hayê min jê tune. Ez karekî xêrê dikim. Nesunetkirina keçan ne li gorî razîbûna Xwedê û ola Îslamê ye.

- Zarokên tên sunetkirin çend salî ne?

3-4 salî ne.

- Hun çi aleta bikar dihênin?

Ez bi zimanê organên wan digirim û bi ciletê jê dikim. Bi xweliyê jî xwînê radiwestînim.

- Hetanî nuha çend keç ji aliyê te ve hatiye sunetkirin?

Zêdeyî 1 000 keçên biçûk ji aliyê min ve hatine sunetkirin. Gundên nêz keçên xwe ji bo zunetkirinê dişînin cem min.

Kêmbûna têtikiliyê

Li aliyê Badînan sunetkirina keçan kême e. Me li aliyê Soran ji xelkê pirs kir ku çiqasî hayê wan jê heye. Ji 40 480 kesan tenê 1 251 kesan zanîbû ku li wir kême e.

Tirs

Ji 40 480 jinan ku ketine ber lêkolînê, 30 324 ji wan sunetkirî bûn. Jinan qala dema suneta xwe û bîranînan hovîtiyê wisa anîne zimên: *"Em ê qet wê dema bi fedîbûn û tirsê barkirî jibîr nekin"*.

Orgazm

Ji 30 324 jinên ku bi wan re hevpeyvîn hatine kirin, 13 655 kes zewicî ne. Ji wan 13 650 jinan anîne zimên ku, di dema eleqata cinsî de, çi caran orgazm nebûne. Têr nebûne.

Zaniyariya li ser seqetmayîne

Sunetkirina keçan li cem keçan seqetiyên laş û rûhê pêk dihêne. Li ser pirsê hevpeyvînek berfireh li Erbilê hate pêkanîn. Ji 9 240 jinan tenê 170 kes hayê xwe zaniyariyê hene. Li Silêmaniyê ji 19 840 jinan tenê 4 000 kes li ser pirsê zane ne.

Pêşniyar ji bo rawestandina sunetkirina keçan

- Ji awira bijjîkî ve bi rêya semîneran belavkirina zaniyariyê
- Divê qala seqetbûyîne bi nimuyên eşkere bê kirin. Bi alîkariya programên tv û radyoyî gundên dur bêne îformekirin
- Divê hemşîreyên li Herêma li ser pirsê bêne perwerdekirin. Navê pîrejinên sunetkar bêne peydekirin da ku ew bêne cezekirin
- Li ser pirsê perwerdekirina mamosteyan û bi rêya wan ronîkirina xwendevanan
- Divê oldarên kurd li ser pirsê bi rola xwe rabin, rê li ber sunetkirina keçan bigirin.

Peyva dawiyê

Sunetkirina keçan ji adet û çanda kurdan dur e. Çi eleqeya xwe bi baweriya kurdan tune ye. Ji bo ku rê li ber sunetkirina keçan bê girtin divê ev rastî di nava xelkê de bê belavkirin.

TABLES DISPLAYING DATA COLLECTED

Erbil Governorate:

First Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	collective town	1985	-	-	-
2	"	1995	1100	1030	93 %
3	"	2001	1200	1020	85 %
4	"	2002	1700	1020	60 %
			4000	3070	

Remarks

1985 not existed

1995-2002 3070 have been circumcised out of 4000

Second Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	Villages	1985	400	400	100 %
2	"	1995	450	427	94 %
3	"	2001	700	625	89 %
4	"	2002	650	490	72 %
			2200	1942	

Remarks

1985-2002, 1942 have been circumcised out of 2200

Third Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	poor and less	1985	30	28	95 %
2	educated	1995	30	26	85 %
3	quarters	2001	30	15	51 %
4		2002	30	9	31 %
			120	78	

Remarks

1985-2002, 78 have been circumcised out of 120

Fourth Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	Middle class	1985	30	22	75 %
2	quarters	1995	30	18	61 %
3		2001	30	7	25 %
4		2002	30	4	25 %
			120	51	

Remarks

1985-2002, 51 have been circumcised out of 120

Suleymaniye Governorate:**First Table**

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	collective towns	1985	-	-	-
2	"	1995	1500	1340	89 %
3	"	2001	1200	900	75 %
4	"	2002	1500	825	55 %
			4200	3065	

Remarks

1985 not existed

1995-2002 3065 have been circumcised out of 4000

Second Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	Villages	1985	7390	7390	100 %
2	"	1995	3500	3200	91 %
3	"	2001	6500	5150	79 %
4	"	2002	3840	2450	63 %
			21230	18190	

Remarks

1985-2002, 18190 have been circumcised out of 21230

Third Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	poor and less	1985	1000	730	73 %
2	educated	1995	750	490	65 %
3	quarters	2001	900	368	40 %
4		2002	900	180	20 %
			3550	1768	

Remarks

1985-2002, 1768 have been circumcised out of 3550

Fourth Table

Ser.	Location	year	total of participants	no circumcise	rate
1	Middle class	1985	1700	1200	70 %
2	quarters	1995	1200	425	35 %
3		2001	1700	180	10 %
4		2002	1850	100	5 %
			6450	1905	

Remarks

1985-2002, 1905 have been circumcised out of 6450

Place of birth

Present settlement	number	Percentage rate	place of birth	Number	Percentage rate
Collective town	3422	11 %	village	2700	8 %
Village	8150	26 %	Collective town	12240	40 %
City	2790	9 %	Village	1012	3 %

□□□□

Factors behind existence of this practice

Location	Factors	Number
Village	religion	20190
	Illiteracy	200
Collective town	religion	5980
	Illiteracy	102
	Political circumstances	50
City	religion	652
	Illiteracy	1050
	Lack of freedom	2100

□□□□

Reasons for not talking about this practice

Location	Factors	Number
Village and collective towns	it is shameful	21180
	Family secret	5101
	They do not know	279
City	It is shameful	480
	Lack of freedom	3222

□□□□

The responsible person for undertaking the act of circumcision

Location	Number	Percentage
Mother	17243	56 %
Grand Mother and Aunt	3073	10 %
	10003	32 %
The person herself	5	16 %

Beş IV

Em ê di vê beşê de dîtina oldar û nivîskarê nasdar Zeynelabidîn Zinar li ser sunetkirina keçan pêşkêşî we bikin. Hêja Zinar pirsê ji awira Qurana Pîroz, hedîsên Cenabê Pêxember Muhamed û kirinên wî dinirxîne.

Zeynelabidin ZINAR ji Bakûrê **Kurdistanê** ye, di **1953**-an dehatiye dinyayê. Ji malbateke xwendewar û bawermend e. Yazdeh sal medreseya kurdî, sê sal meketeba "**Imam-Xetîb**" û sê sal jî lîse xwendiyê. Li dor sê salan meletî kiriye, li hin mizgeftan waz dane û xutbe xwendiyê. Du pirtûkên wê bi navê **BAWERMENDÎ-I** û **BAWERMENDÎ-II** ku li ser Eqîdeya Îmanê hatine nivîsandin gelekê balkêş in. Ev e 25 sal in ku li Swêdê dijî. Zinar endamê van saziyan e:

- Sendika Nivîskarên Swêdî, Sedîka Rojnamevanên Sînornenas, PENa Swêdî, Komela Nivîskarên Kurd a Swêdê.

Zeynelabidin Zinar wek nivîskar û lêkolîner kar dike, heta niha 82 pirtûkên wî hatine weşandin.

Oldar û nivîskarê nasdar Zeynelabidîn Zinar: Sunetkirina keçan gunehêk mezin e

- Bingehê dinê îslamê Qurana Pîroz û Hedîsên Cenabê Pêxember Muhamed e. Dema mirov herduwan bingeh bigire, dikare çawa sunetkirina keçan binirxîne? Sunetkirina keçikên biçûk guneh e an xêr e?

Berî her tiştî divê bê zanîn, ka wateya peyvika "sunet" çiyê!

Sûnet, di zimanê erebî de bi wateya "mîna" û "weke" ye. Lê ev peyv bi taybetî ji vê yekê re hatiye gotin ku mirov weke ku Mihemed Pêxember kiriye bike.

Ji aliyê olî ve "sunet" ew kiriyar e, eger tu bikî tu dibî xwediyê xêrê. Eger tu nekî, ne guneh û ne jî bêxêrî ji te re çêdibe.

Erê rast e ku Ola Îslamê li ser Qurana pîroz û hedîsên cenabê Pêxember hatiye avakirin. Sunetkirina keçan, ne di Quranê de heye û ne jî di Hedîsên Pêxember de hatiye dîtin. Lewra kesî nebihîztiye ku Mihemed Pêxember keçên xwe sunet kirine yan, ji 13 jinên xwe yekê sunet kiribe.

Sunet, ne ferman e, lê "mutabê'e" ye, yanî kirina mina ya Mihemed Pêxember e. Lewra Pêxember dema ku ji diya xwe re çêbûye, ji zikmakî ve sere cûcîkî wî jêkirî bûye. Îcar ev hawe ji misilmanan re bûye mînak û ew jî cûcîkê zarûkên xwe yên kurik, mina yê Pêxember dikin. Ji xwe ne Quran û ne jî Hedîs, behsa jêkirina serê cûcîk û zîlika zarûkan nekirine.

Jêkirina çermilaqê di sere cûcîkê zarûkan de ji ber vê sedemê ye: Pîsîtayî ku di binê wî çermilaqî de kom dibe, nexweşiyê çêdibe. Eger mirov zarûkên lawîn sunet neke jî, guneh jê çênabe.

Îcar madem sunetkirina zarûkan di Quran û Hedîsan de tune, herweha Mihemed Pêxember jî tiştêkî wisa nekiriye û ne jî gotiye, nexwe kesê ku keçan sunet bike, gunehkar dike.

Jêkirina perçeyek ji laşê mirovan, di ola Îslamê de gunehkariyeke mezin e û sezayê wê kiryarê jî, bi Ayeta Qurana pîroz, hatiye diyarkirin ku eynî seza wê bête bikaranîn:

Yanî dema tu tiliya kesekî jê bikî, dive tiliya te jî bête jêkirin. Dema tu bêvila kesekî jê bikî, dive bêvila te jî bête jêkirin. Dema tu navgavê keçekê jê bikî, dive sezayê te jî eynî wisa bête dayîn.

Îcar madem tiştêkî ku di Quran û Hedîsan de nebe, ew ne karê bisilmantiyê ye, hem jî ew kiryar gunehkariyeke mezin e.

Lê belê mesela sunetkîrîna keçan hêj li cîhada Îslamî di nava misilmanan de nehatiye fêmkirin ku çî ye, tenê ew amac ji aliyê grûbek kes vet ê zanîn.

Rastiya meselê çawa ye?

- Heskîrîna mêrê misilman, pir ji kêmuşê (seks/cinsî) re heye. Ji xwe diyar e ku mafê merêkî misilman heye ku çar jinan ji xwe re bîne, yanî çar jin di eynî demê de mehr bike. Lê dema ku merê çar jinan, nikaribe bayê kêmuşa her çar jinên xwe daxîne, wê çavên wan jinan li derve bigere. Îcar mêrên misilman çare ji vê yekê re "sunet" kirin dîtin.

Min bi xwe çend sal berê lêkolîn li ser sunetkîrîna keçan kiriye. Min bi hin riyên badayî, pirs ji hin jinên ku di dema zarûktiya xwe de sunet bûne, daye kirin. Hin ji wan jinan niha li Swêdê dijîn. Jineke ji Efrîqayê weha bersiv daye:

Dema ez zarûk bûme, ez jî hatime sunetkîrin. Suneta keçan li welatê me edet e û pir jî normal e. Şehweta min ya cinsî ji ber sunetkîrîna bi temamî miriye. Dema merê min tê livîna min, ez tu xweşî his nakim, lê nexweşiyê his dikim. Dema hin jin dibêjin ku ew ji têkiliya cinsî zewq digirin, ez şaş dibim...

Îcar ji aliyê bizişkî ve jî eger ev gotinên jinika sunetkîrî bêtin pesendkirin, nexwe mêrê misilman ji bo her yekê bibe mêrê çar jinan û da şehweta jinên wan tune be, jêkirîna zîlîka keçak bi nava "Suneta Pêxember" di nava misilmanan de kirine edet. Lê kes napirse, ka Mihemed Pêxember kîjan keça xwe sunet kiriye?

Gelek tişt hene ku niha di nava misilmanan de bi nava "sunet" yan navekî din tên kirin, lê ew kiryar bi rastî di ola Îslamê de nînin.

- Wezîfeya dê û bavan li hemberî sunetkîrîna keçan çî ye?

Wezîfeya dê û bavan li hemberî sunetkîrîna keçan, girêdayê bi zanîn û têgihandina dê û bavan a olî ve ye. Eger dê û bav oldarên nezan û xişîm bin, çî ji sofî û "zana" yê nezan bihîztibin, dê meseleyên xwe yê olî wisa binirxînin. Wek mînak, Xwedê gotiye:

Eger tu karibî rojî bigirî, bigre. Yanena, rojî li ser te ne wacib e.

Lê ez bûme dîdevan ku kesekî nexweş di rojiya Remezane de, ji birçiyar miriye û tiştêkî nexwariye.

Gotineke **Hz. Elî** heye:

El cahîlûne hemîrun, we lew kane emîrun. Ango nezan eger mîr bin jî, ker in.

Heçika oldarê zana û bawermend, hertim li rastî û leşaxiyê disêwirin. Ew kesên ku keçên xwe "sunet" dikin, pir nezan in û pir jî olperest in.

Ez dikarim gotina xwe ya dawîn weha bêjim: Çewa nezanîn mirov dibe hîlakê, olperestî jî mirov dibe olbetaliyê.

EuroKurd Human Rights – www.eurokurd.net

Wêne



Bayan Nasih



Thomas von der Osten-Sacken



Suaad Abdul rahman



Ronak Faraje



Zeynelabidîn Zinar

EuroKurd Human Rights-EHR

EuroKurd Human Rights dezgehek însanî ye û li ser pirsê mafê mirovan li Kurdistanê dixebite. Dezgeh bi çî hêz û îdeolojiyan ve ne girêdayî ye, ji awira aborî ve serbixwe ye. Xebata xwe li ser bingeha rojnamevaniya lêkolînî pêk dihêne û pirsê mafê mirovan li ser esasê qanûn û peymanên navnetewî dişopîne.

EuroKurd rapor û nûçeyên li ser pirsê berhev dike û yê giring werdigerîne kurdî. Paşê ji bo ronîkirina raya giştî bi rêya malpera xwe belav dike.

EuroKurd bi dezgehên navnetewî /netewî yê însanî re têkiliyan datîne.

Zarathustra News ji bo berhevkirina nûçeyên li ser pirsê, di xizmeta EuroKurd Human Rights ê de ye. www.eurokurd.net li ser bingeha armancên EuroKurd ê weşana xwe dike. Naveroka malperê giraniya xwe li ser pirsên mafê mirovan li Kurdistanê û ewlekariyê ye.

Bi silavên dostanî û biratiyê
EuroKurd Human Rights
Stockholm

Organisation: EuroKurd Human Rights – EHR
News Service: Zarathustra News
Home page: www.eurokurd.net
E- mail: zarathustra-news@comhem.se